*anemon*

Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi
Journal of Social Sciences of Muş Alparslan University
Yıl/Year: 2017 ● Cilt/Volume: 5 ● Sayı/Number: 2

ISSN: 2147-7655 ● e-ISSN: 2149-4622

**ÇEVİRİ YAZISI ● TRANSLATION ARTICLE**

# Têkilîya Nefs û Bedenê [a]

Gulâmhuseyn İbrâhim-i DÎNÂNÎ [b], Rahmetullâh KERİMZÂDE [c]

Çeviren / Translated by
Seyhmus ORKIN [1, d]

[1] Öğr. Gör., Muş Alparslan Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Böl.- Muş/ Türkiye

Başvuru tarihi: 12 Ocak 2017 Düzeltme tarihi: 14 Nisan 2017 Kabul tarihi: 20 Nisan 2017

## Kurte

Mijara nasîna nefsê, ji demên berê ve hem di navbera feylesofan û ehlê kelamê de û hem di temamê dînan de cihekî muhim girtîye û nasîna nefsê di vê çarçoveyê de wekî mifteya nasîna Heq (Xweda) û axiretê hatîye zanîn. Ev mijar, li şerqê û li xerbê bi heman şêweyî nehatîye nirxandin. Di vê navberê de Îbnî Sîna eql bi tevahî mucerred zanîye û ji ber ku nefs jî ji karên eqlî ye, nefs jî mucerred qebûl kirîye. Ya muhim ev e ku çawa ev hêmana mucerred bi bedena maddî re têkilî datîne. Lê belê Molla Sedra, li ser esasê hereketa cewherî qani' bû ku nefs, di destpêkê de cism e û nefs û beden bi hev ve girêdayî ne. Di encamê de, li gorî nêrîna Hekîm Muderris Zunûzî, têkilîya nefsê bi bedenê re li ser terkîba yekîtîyê pêk tê.

## Peyvên Sereke

Nasîna Nefsê, Nefs, Beden, Mucerred, Maddî, Hereketa Cewherî, Destpêka Nefsê.

---

[a] Bu çalışma, Gulâmhuseyn İbrâhim-i Dînânî ve Rahmetullâh Kerimzâde'nin Mecelle-i İlahiyāt u Huḳûḳ-i Dānişgāh-i Reżevī dergisinde Farsça yayınlanan "رابطة نفس و بدن" başlıklı çalışmasının Kürtçe'ye çevirisidir. Çevirinin yapıldığı kaynak için bkz., Dînânî, G.İ., & Kerimzade, R. (1386 hş.). Rābite-i Nefs u Beden. Mecelle-i İlahiyāt u Huḳûḳ-i Dānişgāh-i Reżevī, (6), 3-28. (Erişim: 10.09.2016), http://www.ensani.ir/storage/Files/20120326104711-1100-180.pdf

[b] Teaching staff at the University of Tehran, Iran.

[c] Ph.D. student in the Department of Philosophy

[d] Sorumlu Yazar/Correspoding Author: Muş Alparslan Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, Diyarbakır Yolu 7. Km, 49250, Muş/Türkiye.
e-posta: s.orkin@alparslan.edu.tr

doi: 10.18506/anemon.285549
URL: http://dergipark.gov.tr/anemon
Copyright © 2013-2017 Muş Alparslan Üniversitesi

# Beden ve Nefis Arasındaki Ilişki

Öz

Nefsin tanınması (bilinmesi) meselesi eski zamanlardan bu güne kadar filozoflar, kelamcılar ve dinler arasında önemli bir konu olarak öne çıkmış ve bu tanıma, aynı zamanda Hakk'ı ve ahireti tanımanın da anahtarı olarak değerlendirilmiştir. Bu mesele ne doğuda ne de batıda aynı şekilde ele alınmamıştır. Bu arada İbn Sina aklı tümüyle mücerred kabul etmiş ve nefsi de aklın işlerinden biri olarak gördüğünden nefsi soyut bir varlık olarak değerlendirmiş. Burada önemli olan husus şudur, soyut olan bir varlık, nasıl olur da maddî olan beden ile irtibat kurabilir? Fakat Molla Sadra, cevheri hareketin esesları üzerinden nefsin, başta cisim (madde) olduğuna ve nefis ile bedenin birlik içerisinde bulunduğuna inanmıştır. Neticede Hakim Müderris Zunûzî'nin görüşlerine göre ise nefsin beden ile olan irtibatı, birlik sentezi üzerinden gerçekleşmiş bir irtibattır.

Anahtar Kelimeler

Nefsi Tanımak, Nefs, Beden, Mücerred, Maddi, Cevheri Hareket, Nefsin Başlangıcı

# The Relationship of Nafs and Body

Abstract

The matter of recognizing (know) the nafs (self) has come into prominence between the thinkers, theologians and religions from the old time to nowadays and that recognizing matter is evaluated as a key for knowing Al Haqq and akhirah (hereafter) at the same time. This matter is not addressed in the same way neither in the East nor in the West. By the way, Avicenna accepted the mind (aql) totally single and evaluated the nafs as an intangible entity since he thinks that nafs is one of the works of aql. The important point here is that: how an entity which is intangible could be connected with a body which is tangible. However Molla Sadra, referring to fundamentals of creation believed that nafs is tangible and it is in unity with body. All in all according to Hakim Muderris Zunuzi the connection of nafs with body is a connection which became a reality over the synthesis of unity.

Keywords

Recognizing Nafs, Nafs, Body, Mujarrad (Single), Tangible, the Beginning of Nafs

## 1. DESTPÊK

Heta ku heqîqeta mirinê neyê nasîn, heqîqeta axiretê jî nayê nasîn, heta ku heqîqeta jîyanê me'lûm nebe, heqîqeta mirinê jî dîyar nabe, heta ku heqîqeta ruh muşexxes nebe, di derbarê heqîqeta jîyanê de jî 'ilm nayê peyda kirin û meriv dikare bibêje ku nasîna heqîqeta ruh, nasîna heqîqeta nefsê ye. Her wiha heta ku kesek heqîqeta "Ruhên Ademî" nas neke, ne mumkun e ku bi besîreta xwe axiretê nas bike, çawa ku heta xwe nas neke,

nikare Heq -‘ezze û celle- nas bike. Yanê nasîna nefsa xwe, di heman demê de mifteya nasîna Xweda û nasîna axiretê ye.

Ji demên berê ve meseleyeke pir muhim ku hem di navbera feylesofan û ehlê hikmetê de û hem di hemû dînan de cih girtîye ev e ku însan, xwedîyê nefs û bedenê ye. Di navbera nefs û bedenê de dualîzmek hatiye tesewwur kirin. Yanê çawa ku însan mewcûdek wahid (yek) e lê ji du hêmanên nefs û bedenê teşkîl bûye ku ev her du hêmanên cuda di însanê de bi hev bi şiklek yekîtîyê pêk tînin. Yekîtîya wan, yan di rewşa terkîba yekbûna herduyan de ye yan jî bi terkîba girêdayîbûna wan e. Ev her du hêman yan bi hev re girêdayî ne yan jî bûne yek, eger ku bi hev re bûne yek çawa du tiştên ku di eslê xwe de “du” ne dibin “yek”. Ma dibe ku du tişt digel dubûyîna xwe bibe yek. Li gorî min ev yekbûn ji muhimtirîn pirsgirêkan e ku lazim e em li ser bisekinin û di demên berê de jî (ehlê ilmê) li ser vê meseleyê sekinîne. Ev mesele ne bi tenê li şerqê ne jî bi tenê di nav dînan de, li xerbê jî cihekî muhim girtîye, belkî di dema felsefeya Eflaton û Arîsto de jî bi heman awayî hatiye destnîşan kirin (Arîsto, 1349: Defter-ê Ûla) û li xerba nû jî ev mesele di rojevê de ye (Subhanî, bt: 9). Heta Dekart giriftarê vê dualîzmê bû (Dekart, bêtarîx: Te’emmol-ê Dovvom). Dema ku di her tiştê de kete gumanê wiha got: “Difikirim, nexwe ez heme” û ji “hizrê” ve dest pê kir ku bi rastî ji nefsê ve dest pê kir lewra hizr û raman karên nefsê ne. Eslê destpêka Dekart ev bû ku ez hizr dikim her wiha heme. Baş e hizr bi xwe karê nefsê ye. Paşê wî, xwe wekî “hizr” dît. Lê wextê ku esl hizr be, wê çaxê yên xeyrê hizrê çi ne? Ew di mijara isbata bedenê de dûçarê muşkilan bibû. Yên din ku di isbata nefsê de dûçarê muşkilan bibûn lê belê ew û pêgirên wî di mijara isbata bedenê de. Eger em “hizr” in, beden çawa ye û çawa em dikarin bigihîjin bedenê? Ev mesele demeke dirêj li xerbê mewzû behs bû. Ji pêgirên Dekart yên mîna Malbranş hewl dan ku bedenê isbat bikin. Ev mesele heta Spînoza berdewam dike. Spînoza ku cureyeke wehdetê wicûdê ji bo tevahîya heyînê qebûl dike dixwaze ku wehdeta nefs û bedenê jî dîyar bike ku tesnîfa vê nêrînê bi mijara me re ew qas têkildar nîne. Meqsed ew e ku bê zanîn ev mesele li her derê di navbera mirovan de bi awayekî cih girtîye û meseleyeke bi muşkil bûye.

Ev mesele di felsefeya Îslamî de û di navbera mutefekirên misilmanan de jî bi yek rengî nehatîye nirxandin. Mutekellimên ekolên cuda yên kelamê yanê Eş‘arî, Mu’tezilî, Şi‘î û Sunî jî vê meseleyê wekî hev fêm nekirine. Feylesofên ekolên cuda jî bi awayekî cuda meseleyê fêm kirine. Mesela di îtiqada Şêx Sedûqê merhûm de -ku wekî îtiqada Şi‘îyan tê bi nav kirin- wiha dibêje: “Îtiqada me ev e ku ruh mîna rîhê (bayê) ye.” Û meseleyê bi dudutîyê dinirxîne. Yanê ew jî nefs û bedenê wekî du tişt qebûl dike û ruhî jî wekî tiştek ji cinsê bayê terîf dike. Niha “ba” mucerred e yan maddî ye? Ba bi xwe mucerred nîne lê letîf e. Îhtimalen di warê etîmolojîyê de peyvên “ruh” û “rîh” ji heman kokê tên, yanê tiştekî heye ku mîna bayê ye lê belê meriv nikare wê bibîne. Hin mutekellim (kesên ehlê kelamê) ruhî bi vî awayî fêm kirine. Gelek mutekellim jî nefsê mucerred qebûl nekirine. Di Bîharû’l Enwara Meclisîyê merhûm de, ev mesele di nêzî sed rûpelan de hatiye vegotin ku gelo nefs mucerred e yan jî maddî ye? Her wiha Meclisî di kitêba ku behsa wê hatibû kirin de bi giştî ji kesên ku nefsê maddî qebûl dikin neql kirîye û ev jî nîşaneyek e ku Meclisî jî nefsê maddî qebûl dike (Meclisî, 1403: 59/ bab 42). Ew, ji muheddîs û mutekellimên mezin gotinan neql dike, lê belê ev neql bi awayekî wisa pêk hatîye ku meriv dibêje qey Meclislî fikrê xwe beyan kirîye. Lê digel vê meriv nikare teqez van neqlan û fikran nisbetê bi bal wî ve bike. Ev hinek muşkil e. Helbet kesên din jî hene ku

nefs mucerred qebûl nekirine. Lê belê nêrîna feylesofên Îslamê, hem ji nêrîna mutekelliman û hem jî ji nêrîna gelek muheddîsan cuda ye. Bi giştî feylesof destpêka nefsê mucerred qebûl dikin, lê belê di vê merheleyê de jî nêrîna wan bi tevahî yekreng nebûye.

## 2. BI NÊRÎNA ÎBNÎ SÎNA "NEFS"

Îbnî Sîna ku pîrê feylesofan e nefsê mucerred qebûl dike. Di kitêbên xwe yên bi navê Îşarat (Îbnî Sîna, 1375: 2/292), Şifa (Îbnî Sîna, 1375: 22 û 319) û di gelek kitêbên xwe yên felsefî de jî, ji bo ispatkirina mucerredbûna nefsê delîl nivîsîye. Ew eqlî teqez mucerred qebûl dike, paşê ji bo ku eql yekî ji karên nefsê ye û meriv nikare eql û nefsê ji hev cuda bike her wiha nefsê jî mucerred dibîne. Gerçî di hin merheleyên dawî yên îdrakê de mucerredîyê qebûl nake mesela xiyalê mucerred nabîne lê belê di heman demê de eqlî mucerred dibîne. Behsa muhim ku di kitêbên Şêx (Îbnî Sîna) de derbaz dibe ev e ku gelo hêmaneke mucerred (nefs) çawa bi bedena maddî re têkilî datîne. Eger ku nefs hem di destpêk û hem jî di dawîya xwe de mucerred e, çawa bi bedenek xas re dibe yek? Nisbeta mewcûdeke mucerred bi hemû mewcûdên dinê re yeksan e. Her mewcûdek ku mucerred e, bi mewcûdên maddî ên ku di jêra wî de ne, di heman nisbetê de ye. Lewra ya mucerred ji ya maddî bilindtir e. Niha çawa dibe ku hêmaneke mucerred ku hatîye şandin û bi sînorên zeman û mekanê sînordar nîne, mesela nefsa Zeyd ku mucerred e, yan jî em ferz bikin ku mucerred e, çawa bi bedena Zeyd re têkilî datîne ku bedena Zeyd bi sînorên zeman û mekanê sînordar e.

Eger nefs di pêşîya têkilîya bi bedenê re mucerred e, çawa di dawîya têkilîya bi bedenê re hadis dibe? Hêmanek ku mucerred e û li ser zeman û mekanê ye, çawa bi bedena maddî re ku di nav şertên zeman û mekanê de ye têkilî datîne? Zahiren gotinên Îbnî Sîna û feylesofên ku li rêça wî ne ev e ku nefs mucerred e û bi bedenê re têkilî danîye (Heman cih: 317; Îbnî Sîna, 1375: 2/286 û 3/259). Ew û pêgirên wî di têgihîştin û dîyarkirina vê meseleyê de gelek zehmetî dîtîne. Îbnî Sîna digel kitêbên xwe yên felsefî di Qesîdeya Eynîye de (bnr. Faxûrî, bt., 500) jî wiha dibêje:

هبطت إليک من المحل الأرفع          ورقاء ذات تعزّز و تمّنع

Yanê nefsa mucerred li vê derê teşbîhê kevokek kirîye û dîyar kirîye ku ew çûkeke asimanî û bilind e. "تعزّز" û "تمّنع" wê meneyê didin ku ne maddî ye, ji maddeyê çêtir û bilindtir e. Nefs, çûkek mucerred û azad e ku li cîhana melekût e û divê ku ji hêlûna xwe ya melekûtê bifire û bi bedeneke maddî re têkilî dayne. Kelîmeya "هبطت" jî bikaranîye ku meneya wê ji jor ve daketina jêr e, yanê ji mucerredbûnê ber bi maddîbûnê ve çûyîn e. Vê behsê Şêx dîyar kirîye.

Di derbarê têkilîya nefs û bedenê de gelek tişt hatine gotin. Ji bo isbatkirina nêrînan gelek mînakên ecêb hatine dayîn. Mesela mînakek li ser komirê hatîye dayîn. Dema ku li cihek agir hebe û komirê ku ji bo şewatê amade ye jî li wê derê hazir be çawa ku herareta agirê bigihîje wê komirê ew ê bişewite. Lê li cihek ku agir hebe şaxeke ter, zû bi zû dê agirî negire. Lewra (ji bo şaxa ter) şertên hewce hê ne amade ne. Yanê "hêmana mucerred" bi agirê alema maddî re hatîye şibandin. Eger ku mewcûdek mîna komir yan jî benzînê bi

agirê re têkilî dayne bi zûtî dê bişewite. Bi vî awayî hatiye xwastin ku têkilîya nefs û bedenê bi mînakan ve bê îzah kirin. Bi rastî xwastine ku bibêjin nisbeta hêmana mucerred yeksan e û ji alema maddî jî bilindtir e. Lê belê ev beden mîna bedena Zeyd dema ku amade bû mîna wê benzînê ye ku amadeyê şewitînê ye. Yanê nefs mîna wî agirî derhal bi bedenê ve digire. Ev mijar û nêrîn bi teferuatên xwe re ji ser kitêbên feylesofan û kitêbên Îbnî Sîna ve hatine.

Yekîtîya mutekelliman jî li ser vê meseleyê tune ye. Hin ji wan teqez nefsê mucerred qebûl nakin hin jî mucerred qebûl dikin. Di vê çarçoveyê de heman gotin hatine dubare kirin û tiştekî nû tune ye. Mesela di kitêba Şêxê Îşraq de ev mesele hatîye destnîşan kirin ku gelo pêşî beden hatîye xuliqandin û paşê nefs hatîye xuliqandin yan jî nefs di dema xuliqandina bedenê de pê re hatîye xuliqandin? Ev beden ku ji bo qebûlkirina nefsê amade ye û nefs jî ji alema mucerredan e ew digel xusûsîyeta hadisbûna bedenê pê re dikeve têkilîyê (Suhrewerdî, 1372: 3/421-422).

Ji alîyê tarîxî ve bi tenê kesekî di pêşîya Molla Sedra de ev mesele destnîşan kirîye û têgihîştîye ku di vê meseleyê de nelihevhatinek heye. Ew kes "Xace Neşîruddîn-ê Ṭûsî" ye ku zanîye ev mesele di warê eqlî de dûçarê muşkilan e (Hillî, 1417: 278). Xace têgihîşt ku di vê meseleyê de nelihevhatineke eqlî heye. Muşkil ev e ku çawa karekî mucerred dibe hadis. Mucerred bi xwe xwedî hudusa zemanî nîne. Eger ku xwedîyê hudusek be ew jî hudusa zatî ye. Di navbera hudusa zemanî û hudusa zatî de ferq heye. Hudûsa zatî bi daxilbûna bedenê re dibe xwedî 'ilet. Herwiha mucerred ku me'lûl e (bi 'illet e) bi heman awayî hadis e, lê belê ne hewce ye ku ew di nav zemanî de be. Lewra mucerred serzeman e û pirsgirêka zemanîbûna nefsê tune. Xace fêm kirîye ku di gotinên Îbnî Sîna de tengasî hene, yanê çawa nefs ku mucerred e û serzeman (li ser zemanê) e, di demeke xas de bi bedeneke zemanî û mekanî re têkilî datîne. Wî terîf û îzahatên ku ji ser mînakên benzîn û komirê ve hatine dayîn bes nedîtîye lewra ev mînak teşbihên şairane ne. Çawa bi teyrê melekûtê re "hebûṭ" yanê daketin pêk tê? Teyr bi xwe qerarê daketinê dide yan jî jê re tê gotin? Bi rastî hebûṭ (daketin) bi serê xwe meseleyek e. Jê re bi rastî destûr tê dayîn û ew tê şandin yan jî ew bi xwe (bi vîna xwe) tê? Dibêjin li alema mucerredan, teqez fişar tune. Karekî mucerred ku pê re fişar tune, gelo dibe ku bi mucerredan re tengasî (zehmetî) hebe? "لا تزاحم في المجرّدات"[1]. Ev hemû mesele, bi pîvana eqlî re zêde lihev nayên. Xace jî bala xwe daye van meseleyan lê belê ji bo wî jî ev mesele hel nebûne. Wî, ji hemû hêja û mutefekirên zemanê xwe re name nivîsîye û çend meseleyên girê yên felsefî ji wan pirsîye. Ji van pirsan yekî jî ev e ku têkilîya nefs û bedenê çawa çêdibe? Yek ji van nameyan dide Fexrê Razî yekê din jî, ji feylesofek re dişîne ku ew bi navê Xusrew Şah tê nasîn û di wan deman de li Dimeşqê dijî. Dema ku nameya Xace digihîje destê wî, ew gelek hurmet û ehemîyetê dide nameyê. Xace jê dipirse gelo fikrê wî di derbarê keyfîyeta têkilîya nefs û bedenê de çi ye? Xusrew Şah hewl dide ku vê pirsa 'eslî ya Xace Neşîruddîn bibersivîne. Lê belê heqîqet ev e ku cewabên wî jî bo muşkilê çare nînin û pirsgirêkê jî hel nekirine. Li gorî min ev mesele hel nebûye û bi bedenê re têkilîya nefsa mucerred xwedî muşkil e.

# 3. TÊKILÎYA NEFS Û BEDENÊ BI NÊRÎNA MOLLA SEDRA

Carinan dipirsin gelo Molla Sedra çi karî kirîye û bi rastî jî nizanin ku Molla Sedra çi karên mezin pêk anîye. Ew yekî ji feylesofên mezin e. Wî li rûyê dinyayê di temamê qernan de pirsgirêkên ku nehatibûn hel kirin dît û ji bo helkirina wan hewl da. Molla Sedra baş zanîbû ku muşkila ji bo Xace dîyar bûye dê ji bo wî jî mewzûbehs be. Yanê çawa mewcûdeke mucerred bi mewcûdeke maddî re têkilî datîne. Ew mucerred ku nisbeta wî yeksan e û li dawîyê nayê yanê hêsîr nabe. Lewra têkilî danîn ku wekî cureyek esaretê ye. Bi giştî di helbestên şairên me de û bi heman awayî di teşbîhên arif û feylesofan de beden wekî qefesê hatîye teswîr kirin.

مرغ باغ ملكوتم نيم از عالم خاك   چند روزي قفسي ساخته اند از بدنم[2]

Yanê teyrekî mucerred ji hêlûna mucerredîyê difire û di qefesa laşê (tenê) de dibe hêsîr. Baş e mucerred çawa dibe hêsîr? Bi rastî mucerred bi esaretê re xwedî nisbeteke çawa ye? Ev ne dijberî ye? Eger mucerred e, hêsîr nîne; eger hêsîr e mucerred nîne. Ev helbesteke xerab nîne, helbet helbesteke qenc e û tê de gelek mene hene. Şairên ku di vê xalê de helbest gotine jî meqseda wan meneyeke din e ku gihîştine meqseda xwe jî. Eger ku em vê, di çarçoveya eqlî de binirxînin, hêmanekî mucerred çawa dibe hêsîr? Mucerred, yanê ji zeman û mekanê azad, çawa di bedenek de ku mehkûmê zeman û mekanê ye dîbe hêsîr? Mumkun e ku hêmaneke mucerred di nav sînorên wicûda xwe de, di mahîyeta xwe de hêsîr be, ev tiştekî din e. Belê her mewcudek di nav sînorên wicûdî de ye, lê belê du mewcûd bifikirin ku yekî jê mucerred e û herdu bi hev re ne ku mucerred di qefesa maddî de hepsî ye. Teswîrek bi vî awayî muşkil e û me‘qûl jî nîne. Molla Sedra jî, mîna Xace, bala xwe da vê meseleyê. Molla Sedra xwast ku bi awayekî vê meseleyê hel bike. Wî baş zanî ku muşkil li vê derê ye. Her wiha dest bi avakirina bingeha eslê hereketa cewherî kir ku eslê hereketa cewherî esleke mezin e û ew berhema çandeke mezin e. Molla Sedra ji wê eslê ‘esîl û mezin ê hereketa cewherî gelek sûd wergirt û meseleyê hel kir. Wî got nefs, teqez rûḥaniyet'el ḥudûs̱ nîne, belkî cismaniyet'el ḥudûs̱ e (Şedru'l-Muteʾellihîn-ê Şîrazî, 1410: 8/330). Hemû vê hevokê dibêjin lê belê bala xwe nadinê gelo di vê de çi mene heye? Bi giştî wiha tefsîr dikin ku nefs bi cismê re hadis dibe, ev bi tevahî xelet e lewra Îbnî Sîna jî heman tiştî gotibû. Wî digot dema ku beden hadis bû nefs jî pê re hadis bû, mîna mîsala benzîn û agirê. Lê belê ev meneya “cismaniyet'el ḥudûs̱ê” nîne. Cismaniyet'el ḥudûs̱ bi vê meneyê ye ku nefsa teqez mucerred û ruhanî hadis nabe, nefs di destpêkê de ruhanî û mucerred nîne. Nefsa mirovan ji hev cuda ye di navbera wan de ferq heye, yanê nefsa Zeyd ji Nefsa ‘Emr cuda ye, lê ev cudatî bi çi awayî ye? Di navbera mucerredan de ferq heye, ferqa wan di bilindî û berjêrîyê de ye. Eql jî xwedî ferq in ku yekî bilind yekî jî nizm e yanê di navberê de tertîbeke wicûdî heye. Qest ji cudabûna (ferqa) nefsan çi ye? Nefs piştê ku ji bedenê cuda dibin di navbera wan de ferq çêdibe ku sedema vê ferqê jî dîsa beden in. Beqaya nefsan yanê hemû nefs baqî ne yan ne? Ev mijareke din e. Lê belê nefsa naṭiqe dema ku ji bedenê cuda bû êdî ji bedena xwe bilintir dibe çêtir dibe. Lê nefs di pêşîya têkilîya bi bedenê re çawa bilindtir û çêtir dibe? Di alema rastî û ‘eyan de dîyarbûna nefsê bilindbûna wê bi çi û çawa ye? Mucerredek ji mucerredek din çawa bilindtir dibe û di navbera wan de ferq çêdibe? Gelo di navbera wan de ferqeke merheleyî heye? Aqil ku di warê emûdî (tûl) de mîna hev in û di navbera wan de ferqeke

wicûdîyê mertebeyî heye, lê di merheleya ufqî (paralel) de çawa di navbera wan ferq çêdibe? Ev muşkil bi Eflatûn û pêgirên wî re jî hebû ku wan, aqilê ufqî bi eʿyanê sabite, esma' û sifetên Heq îzah û te'wîl kirin.

Molla Sedra bala xwe da vê meseleyê û got, nefs di destpêkê de teqez mucerred nîne û em teqez xwedîyê nefseke mucerred nînin. Cenîn û nutfe made ne û hemû merheleyên wan jî maddî ne. Bi rastî mesele nefs nîne, mesele mucerredbûna nefsê jî nîne, mesele madeya xalis e (bê terkîb), mewcûdek xas ê maddî. Ev merheleyên kamilbûnê ji rehmê bi nutfebûnê dest pê dike heta cenînê û heta "me goşt lê kir"[3] . Piştê welidîn û hatina vê alemê jî pê re hê eserên agahîyê tune ne, eserên mucerredîyê pê re tune ne, bi heman hereketa cewherî ev hêmana maddî hereket dike. Ev hereket jî hereketek îştidadî[4] ye. Helbet divê ku bê gotin gelo hemû hereket îştidadî ne yan bi tenê hereketa cewherî îştidadî ye? Eger ku em hereketa cewherî qebûl bikin çawa ku Molla Sedra jî îddia dike ku bi me re hereketa cewherî heye, gelo hereketên din çawa ne? Gelo hereketên din jî di tebî'eta xwe de mîna hereketa cewherî ne yan her yekî ji wan bi serê xwe û cuda ne? Dubare ev mesele tê pêşîya me ku gelo hereketa cewherî ji bo hereketên din cihek dihêle yan her hereketek li ser tebî'eta xwe pêk tê? Eger alem di cewherê de hereket dike wê çaxê cihê hereketên 'erzî li ku derê ye? Ma 'erz li pê cewherê nîne? Qey ew xwedîyê hereketeke din in û di tebî'eta vê hereketê de hereket dikin? Û qey di nav hereketê de hereket pêk tê? 'Elaame Ṭebaṭebaî (1417: 261) vê mijarê destnîşan kirîye û ji xeyrê wî jî kêm kes li ser vê mijarê sekinîne ku hereket di nav hereketê de caiz e yan ne? Eger alem di cewhera zatê xwe de bi zatê xwe ve bi hereket e, ku meriv nikare wê bê hereket bike, yanê cewhera cîhanê ku di hereketê de ye gelo hereketên giştî hereketên cuda ne, û ew hereketên cuda di vê hereketê de pêk tên? Ev lazim dike ku em bifikirin gelo hereket di hereketê de dibe? Ev muşkilek din e ku ez ê nekevim nav vê mijarê.

Molla Sedra bi hereketa cewherî gelek meseleyên din jî hel kirîye. Bi kurtahî mijara ku dixwast hel bike ev bû ku gelo ev hereket, îştidadî ye? Yanê îştidadîya di wicûdê de ne îştidadîya di madeyê de. Lewra îştidadîya di madeyê de xwedî mene nîne. Lewra dema ku îştidad di madeyê de jî hebe divê ku vê bibêjin, gelo made di pêvajoyê de madetir (zêdetir madebûyîn) dibe? Yan made bi heman awayî wekî made dimîne? Eger ku made îştidad peyda bike divê ku em mene bidinê gelo îştidada madeyê çawa çêdibe? Bersiv ev e ku îştidad li vê derê di madeyê de terewwûhê pêk tîne, yanê cism bi terewwûhê ve û made di vê hereketa cewherî û îştidadî de ji alema maddî ber bi alema ruhanîyetê ve diçe. Di vê çûyînê de made hêdî hêdî digihîje ber di mucerredîyê ve. Destpêka mucerredîyê li ku derê ye? Gelo mucerredî di îdrakê de dest pê dike? Cenîn dema ku digihîje îdrakê, heta îdraka hisî û îdraka lemsî[5], ev îdrak destpêka mucerredîyê ye lewra îdrak mucerred e, îdrak teqez ji çîna maddî nîne. Di îdrakê de çavkanîyek maddî heye lê belê çîna îdrakê maddî nîne. Çîna îdrakê mucerred û ruhanî ye. Di vê hereketa cewherî de Molla Sedra berê xwe daye terewwûhê (ev terewûh peyveke xweş e)[6] , yanê made ber bi ruhanîbûnê ve diçe. Made dibe ruh. Cism dibe mucerred û … destpêka wê ya ewil jî îdrakên hisî ne. Ji îdrakên hisî dest pê dike ku ew destpêka mucerredîyê ye û bi heman awayî bilind dibe heta merheleya eqlî ku ew bilindtirîn merheleya mucerredîyê ye. Her wiha heman made mucerred dibe.

Pirsa ku li vê derê balê dikêşe ev e, gelo têkilîya ku nefs bi bedenê re datîne, lê hatîye bexşandin (jê re hatîye dayîn) yan jî nefs bi xwe bi hereketek îştidadî vê xusûsîyetê peyda kirîye û made bi vî awayî guherîye?

Divê ku bê gotin helbet ji madeyê re bexşandin (dayîn) heye lê belê ne bi wê meneyê ku madeyê danîne cihek û tiştekî li rûyê kirine. Bi rastî made bi xwe bexşandî ye (hatîye dayîn). Hereket bi xwe bexşandî ye. Teqez sazîya madeyê, sazîya hereketê ye. Ji bo madeyê hereketa cewherî saz nakin. Eger ku made mexlûq e, ev tê wê meneyê ku hereketa wê jî mexlûq e. Hemû tişt ji alîyê Xweda ve hatine bexşandin (dayîn). Bi heman awayî hereket jî ji alîyê Xweda ve hatîye bexşandin. Mesela Xweda cotbûnê çawa daye çarê (4)? Gelo pêşî çarê dixuliqîne paşê xusûsîyeta cotbûnê dide wê, yan xuliqandina hijmara çarê di heman demê de xuliqandina cotê ye jî? Xuliqandina madeyê di heman demê de xuliqandina hereketê ye jî. Xweda dema ku mewcudên maddî dixuliqîne hereketa cewherî jî di zatên wan de dixuliqîne. Yanê ev mewcûd bi hereketê re hatîye xuliqandin. Bi kurtahî hijmara çarê bi xusûsîyeta çotbûnê ve hatîye xuliqandin ne ku pêşî hijmar hatîye xuliqandin û paşê jî cotbûna wê. Sazî û wicûda madeyê heman tişt e. Çawa ku Molla Sedra dîyar dike, wicûda madeyê xwedî hereket e, sazîya wicûda maddî sazîyek bi hereket e. Yanê hatîye bexşandin lê belê bexşandineke wiha ku hereketa cewherî bi xwe bexşandineke Xweda ye. Xweda her daîm di halê bexşandinê de ye, ne ku carinan dibexşîne carinan jî nabexşîne. Dibê:

بندۀ پیر خراباتم که لطفش دائم است    ورنه لطف شیخ و زاهد گاه هست و گاه نیست [7]

Lutfa Xweda daîm e. Ew li ser evdên xwe daîm bi fezl e, baş e fezla daîm çi ye? Yanê tu mewcûdek tune ye ku fezla wî daîm be, lutfa daîmî bi tenê xusûsîyeta Xweda ye. Heq Tebareke we Teala daîm bi fezl e, yanê lehzeyek bê feyz nîne.

Hereketa cewherî daîm di hudûsê de ye. Hereket, yanê guherbarî, yanê hudûsa daîm ku di mucerredîyê de diherike. Hudûs ji ezelê dest pê dike heta ebedê didome. Ezelîyet bi hudûsê re nakeve nakokîyê. Hûn nikarin dema hatina hudûsê di alemê de peyda bikin. Her dem lutfa Xweda heye û meriv nikare tesewur bike ku Xweda hebû lê lutfa wî tune bû. Li vê derê hudûs bi ezelîyetê re têkilî datîne. Molla Sedra dibêje ku cîhan di zatê xwe de di nûbûyînê de ye û diherike. Hudûs her tim e ne yek car e û mîna fizîknasên ku dibêjin “Bîg Bang” di carek da pêk hat û qedîya û her wiha hudûsê di carek de sînordar dikin ne rast in. Tesewura hereketa cewherî hinek sext e. Lewra hereketa cewherî bi tenê bi însanê re nîne alema maddî bi tevahî hebûn di nav herikînê de ye ji ezelê heta ebedê. Her wiha ev hereket û herikîn daîm e. Bi gotina merhûm ‘Ellame Ṭebaṭebaî: “Alem kargeheka mucerredsazîyê ye” (heman). Ev hereket, hereketek bê armanc nîne, hereketek îştidadî ye, hem her tim hereket heye hem jî her tim îştidad heye. Yanê alem di nav ahengê de ber bi mucerredîyê ve diçe. Va di vê pêvajoyê de nefs jî mucerred dibe yanê însan ji cismanîyetê digihîje mucerredîyê. Ev hereket ne înqilab e, înqilab teqez ne mumkun e. Mutekelliman jî heman xeletîyê kiribûn. Heqîqeta hereketê fêm nekiribûn. Hereket herikîneke bi têkilî û girêdayî ye. Înqilab ji merheleyek cudabûn û derbazbûna merheleyeke din e. Îştidad ne înqilab e. Hereket ji deman teşkîl nebûye belkî hereket têkilîyeke yekîtîyê ye. Û her lehze digihîje alema mucerredîyê. Her tim rêya melekûtê vekirî ye û ev maceraya hereketê didome. Berê alemê, bi awayekî ahengî li melekûtê ye.

Ev robarek e ku berê wê li melekûtê ye. Dema ku meriv mucerred dibe, bi rastî meriv bilind dibe. Heyûla her tim heyûla ye lê belê hereketa vê hêmana heyûlanî bilindîyê peyda dike. Ev hereket ufqî nîne belkî emûdî ye. Ev muşkilek e ku cîhana xerbê vê fêm nekirîye. Cîhana xerbê hereketê ufqî ferz kirîye lê belê hereket emûdî, îştidadî ye û berbilind e. Dema ku meriv bigihîje merheleya mucerredîyê her çi qas made hebe jî êdî giriftarîya maddî ji holê radibe. Nefs mertebeya bilind a bedenê ye. Ji ber vê jî li gorî nêrîna Molla Sedra terkîba nefs û bedenê terkîba yekîtîyê ye. Dudutî di navbera nefs û bedenê de heye û tune. Di destpêkê de heqîqetek e lê belê dema ku merheleyek bilind dibe êdî derdikeve derveyê zeman û mekanê. Beden ji cinsê xakê ye ji cinsê madeyê ye û madeya wê jî her tim di xakê de dimîne. Lê belê însan bilind dibe ruhanîyetê werdigire.

Molla Sedra bi vê tertîbê çend tiştan hel dike. Têkilîya nefs û bedenê li ser vê sûretê bi yekîtîyê pêk tê. Dualîzm ji holê radibe yanê tiştekî heye ku xwedîyê du wechan e. Bi vî awayî Molla, yekîtîya nefs û bedenê dîyar dike, ji nû ve saxbûna cismanî dîyar dike û gelek meseleyên din jî îzah dike.

## 4. TÊKILÎYA NEFS Û BEDENÊ LI GORÎ MUDERRIS ZUNÛZÎ

Lê ji bo hin kesan hê jî muşkil li holê bû. Bi kurtahî yekî ji kesên pir deqîqnezer û li gorî min yekî ji hêjatirîn feylesofên piştî Molla Sedra ye Hekîm Aqa Elî Muderris Zunûzî. Ew hekîmek ecêb û xerîb e. Ew bi xwe jî ji dibistana Molla Sedra ye lê muşkila ku hekîm anîye ziman ev e ku di encamê de wezîfe û berpirsyarîya bedenê çi ye? Wî li ser bingeha Molla Sedra rêyeke din ji bo me‘adê daye pêşîya xwe ku ew rê gelek balkêş û ecêb e. Bi tenê kesekî di vê meseleyê de wekî Zunûzî bala xwe li ser mijarê kûr kirîye. Ew kesê ku ji Zunûzî gelek tesîr wergirtîye û di çarçoveya nêrîna wî de me‘adê qebûl kirîye şagirdê şagirdê wî merhûm Şêx Muhemed Huseyn Kompanî (Ġêrevî Isfehanî) ye ku bi wasiteya (Istehbanatî) şagirtê Aqa Elî Zunûzî ye. Wî me‘ada Aqa Elî Zunûzî qebûl kirîye.

Wî, ji ser bingeha Molla Sedra ve rêyeke din da ber xwe. Hemû dibêjin di alema axiretê de ruh, bi bedenê re têkilî datîne lê belê merhûm Muderris ji ser hedîsek Îmam Ceferê Sadiq (es.) ve rêyek din dide pêşîya xwe. Hedîsa Îmam wiha ye: “البدن حيث الروح” yanê di axiretê de beden bi alîyê ruhê ve diçe ne ku ruh tê cem bedenê. Hadise, bi tevahî berevajî ye. Tê dîtin ku Zunûzî hemû fikr û nêrînên Molla Sedra ji bo îzaha riwayetek Îmam bikaranîye, ez ê bi berfirehî nekevim nav vê. Fikrê me‘ada Aqa Elî gelek muhim e. Ked û diqeta ku di vê mijarê de serf kirîye meriv ditirsîne. Di hemû tarîxa mirovahîyê de tu kesekî ev qas bala xwe nedaye vê mijarê. Di derbarê me‘adê de rîsaleyek wî bi navê Sebîlûrreşad heye.

Min hewl daye ku esasên nezerîyeya Aqa Elî Zunûzî îzah bikim, lewra nêrîna wî gelek tevlihev û sext e. Ji bo vê armancê min kitêbek nivîsî bi navê Me‘âd ez Dîdgag-ê HekîmMuderris Zunûzî ku ev kitêb ji ber van mijarên sext zêde neçû xweşê kesî. Di vê kitêbê de ez li ser sekinîm ku gelo li ser bingeha Molla Sedra rêyeke din ji bo helkirina van meseleyan heye yan na? Ku yek ji wan meseleyan mucerredîya nefsê û têkilîya wê ya bi bedenê re ye û yekê din jî me‘ada cismanî ye ku di çarçoveya heman mijarê de ne. Dema ku em bikarin me‘ada cismanî di çarçoveya eqlî de hel bikin her wiha em dikarin têkilîya nefs û bedenê jî ji ser bingeha yekîtîyê ve hel bikin, lê belê dema ku em ji xeyrê yekîtîyê, bi hev ve girêdayîbûnek (lê zêdebûnek ku paşê pêk tê) qebûlbikin, em ê dûçarê

muşkilê bin. Eger ku meseleya yekîtîya nefs û bedenê hel bû, me‘ada cismanî jî bi awayekî me’qûl hel dibe. Ev rêyek bû ku Molla Sedra di merheleya ewil de hewl da ku bigihîje wê. Û di merheleya duyem de Muderris, xebateke eqlanîyê ‘ecêb pêk anîye! Ev hekîm, ji bo meseleyeke îtiqadî çi qas hewlên eqlanî daye!

Muderris Zunûzî terîfa terkîba heqîqî û hewcehîyên navbera beşên terkîba heqîqî destnîşan kirîye ku divê bê gotin hêmanên terkîba heqîqî heta cihek, ji nêrîn û zanîna gel cuda ye. Wî mijarên jêrê wekî terkîbên heqîqî terîf kirîye:

1-Terkîba nefs û bedenê. 2- Terkîba nefsa naṭiqe di dereceyên cuda de. 3- Terkîba mahîyeta însanê di warê cins û feslê de. Wî hemû bala xwe daye nefsa naṭiqe, û her sê mînakên ku ji bo nefsa naṭiqe gotîye, bi heqîqeta însanê re têkildar in. Her wiha Muderris, têkilîya nefsê bi bedenê re ji ser terkîba yekîtîya made û sûretê ve zanîye û bala xwe daye terîf û îzaha wan.

Bi kurtahî meqseda gotinên wî ev e ku terkîba navbera nefs û melekeyên bedenê terkîbeke tebî‘î bîzzatî ye, lê belê terkîba navbera hêmanên sûretan û nefsê terkîbek tebî‘î bil ‘erzî tê hesibandin. Muderris Zunûzî, piştê ku terkîba nefs û bedenê beyan dike, bi awayekî din istilaha xwe ya bi navê terkîba heqîqî ku wekî terkîbek yekîtî di navbera made û sûretê de ye destnîşan dike. Ev istilaha wî ji terkîba mertebe û melekeyên nefsê pêk tê.

Ew bawer dike ku di navbera nefs û mertebe û melekyên wê de cureyek terkîba heqîqî bîzzatî heye. Lewra mertebeyên nefsê bi vê cureyê ne ku hin mertebeyên wê ji mertebeyên din bilindtir in û hin mertebe jî dîsa ji tevan bilindtir in û ev rewş jî heta sûreta dawî ya nefsê berdewam dike. Ji alîyê din ve hin mertebeyên nefsê ji hin mertebeyên din jêrtir in û hin mertebeyên nefsê jî dîsa ji wan mertebeyên jêr jî li jêrtirin ku ev rewşa ber bi jêrî, heta merheleya madeyê dadikeve. Di vê rewşê de hemû cure mertebeyên nefsê di halê bilindî û berjêrîyê de bi eslê heqîqeta nefsê re (ku di navbera van merheleyan de herikbar e) yek e (Dînanî, bt: 72-70).

Wextê ku nefsa naṭiqe ji bedena xwe xelas dibe, eser û emanetan ji sûretên zatî û melekûtîya hereketa cewherîya xwe datîne cihek ku meriv dikare vê wekî cîgir û xelîfetîyê binirxîne. Ev xelîfekirin ku meriv dikare wekî eserek (jê) mayî jî bizane û ev netîceya tedbîra zatî ya nefsê ye ku li ser bedenê pêk tê. Bi rastî ev wekî karek tebî‘î û afirandî tê hesibandin ne wekî karek ku bi lihevhatinê pêk hatîye. Her wiha piştê ku nefs ji bedenê cuda bû, bi rastî di alema zatî de ji hemû tişt û bedenên cudabûyî diyar (cuda) dibe. Ev cudabûn bi vê cureyê ye ku her kesekî xwedî nezera batinî ye û ehlê mukaşefeyê ye dikare wê muşahade bike. Meriv dikare bibêje ku ev beden heman beden e ku nefsa natiqe ji cuda bûye.

Meseleyek din ku bala meriv dikêşe ev e ku gelo nefs di vê merheleyê de xwedîyê hereketa îştidadî ye, piştê cudabûnê çawa vê hereketê didomîne, yan çawa nadomîne? Divê ku em bibêjin nefs dema ku ji bedenê veqeta êdî bê hereket e, eger ku ji xeyrê vê tiştekî hebe jî ew fezla Rebbanî ye. Mucerred êdî xwedî hereket nîne. Veqetîn, yanê mucerredîyek tam, mucerredî yanê azadî ji kar û barê bedenê. Peyva veqetînê tê vê meneyê. Êdî bi bedenê re karek tune. Dema ku bi bedenê re têkilî nema êdî hereket jî namîne. Eger ku piştê vê rewşê navê amûrên maddî mewzûbehs be wê çaxê divê ku em tenasuxê qebûl bikin. Her wiha eger bi nefsên enbîya û salihan re di alema berzexê de û piştê wê tiştek pêk hatibe êdî ev ne hereket e, ev herikînek e, heke ne divê ku em

mucerredbûna nefsa wan qebûl nekin. Divê ku em ji bingehê vegerin û êdî heqê me tune ku em bibêjin, mucerred. Lewra mucerred tê wê meneyê ku xwedî hereket nîne.

Muderris Zunûzî li vê derê meseleyê destnîşan kirîye ku mijar berfireh e û meriv dikare gelek beşan lê zêde bike. Ew bawer dike ku nefsa natiqe piştê ku xwe ji bedena xwe rizgar bike bi nefsa kullîye re têkilî datîne ku nefsa kullîye bi zat û melekeyên wî re xwedî munasebet e. Beden jî bi hereketa zatî ve kemala xwe mîna hemû mewcûdên bi hereket pêk tîne û ber bi armanca xwe ve hewl dide. Bi vê hewldanê ve ber bi alîyê alema axiretê ve bi rê dikeve. Tevgera bedenê li vê derê ji xeyrê armanca gihîştina nefsa kullî tiştek din nîne. Bi vî awayî nefsa kullî di nav sazîya kullî û ji rêya nefsa cuz'î de hereketa xayeya bedenê ye. Ev beden alîyek e ku nefsa cuz'î, di sazîyek kullî de ji alîyek tevgerên nefsa kullî tê hesibandin. Lê belê nefsa cuz'î piştê ku ji bedenê veqetîya, alîyên hakimîya nefsa kullî bi tenê ji alîyê "qebzê" ve pêk tîne. Di vê rewşê de heman nefsa cuz'î di pêşîya veqetîna ji bedenê de, ji alîyê hakimbûna nefsa kullî ve di halê "bestê" de tê hesibandin.

## 5. ENCAM

Bi vî awayî eşkere dibe ku di navbera fail û mefûlê bizzat de munasebetek tam û kamil zerûrî ye. Bi heman awayî dema ku beden di netîceya hereketa zatî ya xwe de ji merheleya ferqê ber bi merheleya cem'ê, ji gelîya kesretê ber bi wehdetê û ji laşê dinyayê ber bi bilindîya axiretê ve guherî, bi alîyên zat û cihetê ve munasebetek wê ya kamil bi nefsa kullî re çêdibe. Ew yekîtîya ku bi nefsê re li dinyayê pêk tê di merheleyeke hêzdartir û bilindtir de ye. Lewra dinya merheleyek ji cîhana hebûnê ye ku tê de kesret ber bi sûreta wehdetê ve diçe.

Tiştên ku hatine gotin di warê meneyê de bi gotinên feylesofan re mutabiq e, çawa ku gotine: "كل يرجع إلي أصله", yanê her tişt vedigere ser eslê xwe. Bê guman nefsa natiqe ji rûyek ve ji eslê bedenê ye, bi heman awayî beden jî ji alîyek ve eslê nefsa natiqe pêk tîne. Di encamê de ev nefsa kullî ye ku hem eslê nefsê ye û hem jî beden pê re di munasebeta tam û kamil de ye.

Meseleyek din jî ev e ku nefs, di heman merheleya pêşîya veqetîna ji bedenê de ku di rewşeke îştidadî de ye û meriv jê re dikare bibêje mucerred, gelo divê merheleyê de meriv dikare ji bo wê hereketê tesewur bike?

Meriv dikare bibêjê ku li vê derê du rûyê meseleyê hene. Hereket xwedî alîyên maddî ye û veqetîn jî bi rewşeke kullî nîne û însan bi xwe jî di navbera mucerred û maddîyê de cih digire. Ji alîyê ku maddî ye bi heman awayî xwedî hereket e û ji alîyê ku mucerred e jî xwedî bilindî ye. Lê piştê veqetînê êdî em nikarin di hêmanek mucerred de hereketê qebûl bikin. Eger ku hereket bê qebûl kirin ev dibe tenasux, yanê derbazbûna bedenek din ku divê em dîyar bikin di dînê Îslamê de tenasux bi tu awayî nayê pejirandin. Lewra di tenasuxê de pirsgirêkên eqlî hene û ji bo vê jî, behskirina mijarên din divê.

## JÊRENOT

[1] Li cem mucerredan zehmetî/tengasî tune.

[2] Ez teyrê baxê melekûtê me, ne ji alema xakê me Ji bedena min qefesek çêkirine ji bo çend rojan

Morġê baġê melekûtem niyem ez ʿalemê xak    Çend rûzî qefesî saxtê end ez bedenem

[3] Mu'mînûn 23/14.

[4] Hereketa Îştidadî: ew cure hereket e ku di nav pêvajoyê de her ku diçe qewîtir dibe.

[5] Îdraka ku di encama temasa laşî de pêk tê.

[6] Ev şîroveya nivîskarê maqaleyê ye ne şîroveya mutercim e.

[7] Ez bendeyê Şêxê Xerabatê me ku lutfa wî daîm e Dûr im ji şêx û zahidên ku lutfa wan car heye û car tune ye

Bende'ê pîrê xerabatem kê loṭfeş daîm est    Ver ne loṭfê şeyx û zahêd gah hest û gah nîst

## ÇAVKANÎ


١ .ابن سينا، حسين بن عبدالله، الاشارات و التنبيهات، قم، نشر البلاغه، ١٣٧٥ ش.

[Îbn Sîna. (1375 hş.). *El-Îşarat Ve't-Tenbîhat*. Huseyn Bin ʿEbdullah (tes.). Qom: Neşru'l-Belaġê.]

٢ .ارسطو، دربارۀ نفس، ترجمۀ علي مراد داودي، تهران، دانشگاه تهران، ١٣۴٩ ش.

[Arîsto. (1349 hş.) *Derbare-yê Nefs*. ʿElî Murad Davûdî (wer.) Tehran: Danêşgah-ê Tehran.]

٣ .حلي (علامه)، ابومنصور حسن بن يوسف، كشف المراد في شرح تجريد الاعتقا د، قم، مؤسسۀ نشر اسلامي، ١۴١٧ ق.

[Ḥillî (ʿEllame). (1417 hq.). *Keşfu'l-Murad fî Şerhi Tecrîdi'l-İʿtiqâd*. Ebû Menṣûr Hesen Bin Yûsif. Qom:Mûʾessese'-ê Neşr-ê Îslamî.]

۴ .دكارت، رنه، تأملات در فلسفۀ اولي، بی تا.

[Dekart, Rene. (bt.) *Teʾemmolat Der Felsefe-yê Ûla*.]

۵ .ديناني، غلامحسين، معاد از ديدگاه حكيم مدرس زنوزي، بی تا.

[Dînanî, Ġulamhuseyn. (bt.). *Meʿad Ez Dîdgah-ê Ḥekîm Muderris-ê Zunûzî*.]

۶ .سبحاني، جعفر، اصالت روح از نظر قرآن، مؤسسۀ تحقيقاتي امام صادق بی تا.

[Subḥanî, Ceʿfer. (bt.). *Eṣalet-ê Rûḥ Ez Neẓer-ê Qurʾan*. Mûʾessese'-ê Teḥqîqat-ê Îmam Sadiq.]

٧ .سهروردی، شهاب الدين يحيی، مجموعۀ مصنّفات شيخ اشرا ق، تصحيح سيدحسين نصر، چاپ دوم، تهران، مؤسسۀ مطالعات و تحقيقات فرهنگي، ١٣٧٢ ش.

[Şehabeddîn Yehya Suhrewerdî. (1372 hş.). *Mecmûʿe-ê Muṣenefat-ê Şeyxu'l-Işrâq*. Seyyîd Huseyn Neṣr (tes.). Tehran: Mûʾessese'-ê Muṭaleʿat u Teḥqîqat-ê Ferhengî.]

٨ .صدرالمتألهين شيرازی، محمد، الحكمة المتعالية في الاسفار العقلية الاربعه، چاپ چهارم، دار احياء

التراث العربي، ۱۴۱۰ ق.

[Muhemed Ṣedrulmuteʿellihîn-ê Şîrazî. (1410 hq.). *el-Hikmetu'l-mute'aliyye fî'l-esfari'l-eqliyyeti'l-erbe'e*. Daru'l-Ihya et-Turasu'l-'Erebî. ]

۹ .صدوق، محمد بن بابويه، التوحيد، تحقيق و تعليق سيدهاشم حسيني تهرانی، قم، جامعۀ مدرسين، بي تا.

[Ṣedûq, Muhemed Bîn Babûye. (bt.). e*t-Tewḥîd, Teḥqîq u Teʿlîqê Seyyîd Haşim Huseynî Tehranî*. Qom:Camiʿe-yê Medreseyn.]

۱۰ . طباطبايی، سيدمحمدحسين، نهاية الحكمه، چاپ چهاردهم، قم، مؤسسۀ نشر اسلامی، ۱۴۱۷ ق.

[Seyyîd Muhemed Huseyn Ṭebaṭebaî. (1417 hq.). *Nihayetu'l-Ḥikme*. Qom: Mûʾesseseʾ-ê Neşr-ê Îslamî.]

۱۱ . فاخوری، حنا و خليل الجر، تاريخ فلسفه در جهان اسلام، ترجمۀ عبدالمحمد آيتی، بی تا.

[Faxûrî, Ḥenna u Xelîl El Cur. (bt.) *Tarîxê Felsefe Der Cehanê Îslam*. ʿEbdulmuhemed Ayetî (wer.).]

۱۲ . مجلسی، محمدباقر، بحارالانوار، تحقيق محمدباقر بهبودی، بيروت، مؤسسة الوفاء، ۱۴۰۳ ق.

[Muhemmed Baqir Meclisî. (1403 hq.). *Biḥaru'l-envar*. Muhemmed Baqir Behbûdî (teh.) Beyrût: Mûʾesseseʾ-ê El-Vefa.]